Ew dayika..kulmek dan

Silêman azer

Riwê wê dayika
pijiqî,
ser şopin xûz,
ji bablîsokên bêrîkirinan..
Sinciriye sîng
ji bûrîna demkokin zexel
ji barkirinê...
hîvaztine...
şevbuhêrkên gundîtiya xwe
bi barandina bergirtinên
sînga xwe,
li ser mendaletiya
keyandî bi berbangin şînbûyî
bi dilovaniyê..
Ew dayika,
serî hinekirî
bi saldîdeya cihin
mijûl bi perestina tozik
û qelşin
hingavtî bi rizîbûnan.
Berbakiriye..,
temenê komkirî
kulmek dan
ji dêrana çilmisandinê re.
tîre..guvaştina bînayiyin
pînekirî bi hişkayiyê..
Bi deriyê xweziyan ve

zeliqiye,
ew dapîra,
rojên,
xiloxavî di bexçika
tavsorkan de vedişêre..
belkî ez firişik kirîme,
bi nehwirandinên wê,
yên,li ser kinarên bîreweriyê
zîz dibin..
çend caran..?
dikarîbû vedize ji şîniyê
demkokin şahiyê..

silemanazer@hotmail.com